

# Koletiya nûjen li Avûstrlyayê rûdide



Koletiya nûjen wê demê ye zorbêji, gef an bêhêvîti bi kar werin ku ji kesan behre were girtin û ew ji azadiyê bêpar bibin. Ev li Avûstrlyayê sûcên giran in û qaçaxa kesan, koletî, koledarî, zewaca zorê, karê zorê, girêdana deyndariyê, şiklên her nebaş ên karê zarokan, bikaranîna ji bêhêvîtiyê bo kar an xizmetan in.

**Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin tê behre wergirtin,  
em dikarin arîkariya we bikin.**

Bo agahî yan hevpirsîna neêşkere, ji kerema xwe bi Xaça Sor a Avûstrlyayê re pêwendiyê çêbikin. Ji **03 9345 1800** re **telefon bikin an ji [national\\_stpp@redcross.org.au](mailto:national_stpp@redcross.org.au) re e-name bikin**

# DIVÊ LI SER KAR BI WE RE BAŞ REFTAR BIBE.



## Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin:

- Neçar bibin kar bikin an ser karî ewle nebin
- Gelek saetan kar bikin bêyî ku bêhna xwe vedin
- Diravê kesekî rast nedin
- Diravekî deyn ê mezin bidin bo bikarhêner an karsazekî ji ber sefer, mayîn, cil û kinc, xwarin, çûyînhatin an belgeyên karkirinê
- Nikaribin cihê xwe yê karkirinê biterikînin an ser mercan gotûbêj bikin
- Li ser karî gef an tirs ser kesekî hebe, wekî bibêjin hûn ê bi paş ve werin vegerandin yan endamên malbatê dê ziyane bibin
- Nikaribin xwe bigihînin pasaporta xwe yan belgeyên din ên pênasayê
- Li mala kesekî kar bikin û ji ber delîlên şexsî yan civakî gelekî kêmbikarin biterikînin
- Ji kesekî re gotinên nebaş, reftarên piçûkkirinê, destdirêji yan tundî werin kirin.

## Arîkarî mimkin e

Xaça Sor hevpirsîn û piştevanîyê dike, û dikare bo arîkarîyê we bişîne beşên din ên xizmetê. Xizmeta wergera devkî heye. **Ji 03 9345 1800 re telefon bikin an ji national\_stpp@redcross.org.au re e-name bikin.**

Herwiha **bernameyêke piştevanîyê** heye ku arîkarîya gel dike jiyana xwe ji nû ve çêbikin. Ev bername arîkarîya kesan dike ku cihêkî ewle bo jiyandê peyda bike, piştevanîyê dike muqatebûnên bijîşkiyê, rawêjkarî û hevpirsîna hiqûqî û koçberiyê, piştevanîya malî hebin, bo perwerde û hinkirinê yan peydakirina kar, û tîkiliyên civakî arîkarîyê dide. Xaça Sor dikare li bara vê bernameyê agahiyên pirtir bide.\*

Eger lezgin be yan ser ewlehiya kesekî gef hebe bi **000** ji polis re telefon bikin. Bo raporkirina mijareke ihtimalî ya koletiya nûjen bi **131 237** ji Polîsê Federal ê Avûstralyayê re telefon bikin.

## Mafên xwe nas bikin

Hemû karkerên li Avûstralyayê mafên wan ên bingehîn hene ku qanûn wan diparêze. Ev qanûn bo hemû karkeran e hetanî yên ji welatên derve, bêyî ku guh bide qasa mayîn an cûreyê vîzaya wan li Avûstralyayê.

Bo agahiyên li bara mafên cihê xwe yê kar, hûn dikarin serdana **www.fairwork.gov.au** bikin, yan bi **13 13 94** ji Fair Work Ombudsman re telfon bikin.

Eger pêdiviya we bi wergêrê devkî heye, bi **13 14 50** ji Beşa Wergera Nivîskî û Devkî re telefon bikin.

\*Wezaretê Xizmetên Civakî xercê Xaça Sor a Avûstralyayê dide bo ku Piştevanîya Bernameya Kesên Qaçaxbûyî pêk bîne.